

Charles Darwin û Apê Mûsa

Mîrhem Yigit

Navê meqaleyekê ji yê Apê Mûsa Anter wuha ye:

„ Ez û Platon“.

Mûsa di tevahiya vê gotara xwe de rewşa xwe û ya Pilaton, şertên xwe û yê wî, malbata xwe û ya wî, mamosteyên xwe û yê wî, dide ber hev, dixê du aliyên mêzênê û bi hev re miqayese dike.

Destpêk û rêzên ewil jî wuha ne:

„ Hûn dê niha bêjin Mûsa tu li ku û Pilaton li ku“, tu jî radibe xwe bi kê re miqayese dikî, ma wuha dibe ? „ Xemnake em herdû jî, ez jî û Platon jî em evdên Xwedê ne“ .

Îca tiştê Apê Mûsa ji bo xwe û Platonê girekî dibêje, em jî em dê ji bo wî û Charls Darwinê Ingilîz bêjin û îro navê meqaleya xwe jî bikin Charles Darwin û Mûsa.

Nebêjin ev çi bihevrebûn e, çi têkiliya van herdû navan heye bi hev re, Mûsa li ku û Darwin li ku ?

Ev kombînasyona dunavî ne bêbingeh e. Hem jî gelekî bi xwurtî û ji ber nîqaşa di rojevê de ku li der û dora Charls Darwin diçe û tê.

Cîhan cardî bûye du birr, du şiqên mezin, alî û firaksiyon: Alîgirên Darwin û yê dê û bavê me Adem û Hewwa.

Kombînasyona Darwin û Mûsa û navê meqaleya me jî bi vir ve pêwendîdar e.

Binerin çawa:

Mûsa girtiye. Demeke di Tugaya Mêrdînê de di bin asaq û îşkenceyan de ye. Ew ne cara ewil e li vir, hejmara girtin û binçavkirinên xwe, bi xwe jî tam nizane Mûsa. Roja bêheqaret, bê lêdan û bi bêhurmetî tune. Di bîranînên Mûsa de behsa van rojan heye.

Rojekê efserekî garnîzonê bi hejmarek leşker re dadikeve îşkenceyaneya Mûsa lê. Çavên Mûsa girtîne. Subay wê wextê xwe derbas bike, bêriya tinazan kiriye, di nav bêbavîyên vê neyargehê de, ne tenê sadîzm, belê bêhnikên wuha jî, qerfpêkirin û henekpêkirin jî hene.

Dipirse Efser: Mûsa, dibêjin tu mirovekî xwendayî, tu xwedî serpêhatî û tecrûbeyî, tu ji min re nabêjî, em ji Adem û Hewwa ne, yan mîna Darwin dibêje em ji heywan û meymûnan in ?

Mûsa meselê fêhm dike, derdê efser zane û bi giş aqilmendiya mûsayî, pilatonî û sokratî, û ji cîhekî û pêde jî diyojenesî wuha bersivê dide:

Ezbenî, dema ez bala xwe didim me mirovan, tiştên em tînin serê hev, pêhn û kulmiskên em li hev didin, hilkirin û rakirina neynûkan, perçekirina serê însanan, şikenandina laş û bedenên ciwan, pîsîti û xerabiyên em di hev de dikin, hevdûgevizandinên di nav xwîne de, dalqandin û lêdana li însanan, bi rojan bêxwarin, bêvexwarin, bêxew û bêxweşûstiniştina wan, bêhtir qeneeta ku, tiştê Darwin dibêje, wê rastir be li ba min çêdibe, tesbîten Darwin nêzîktirî aqilan xwiya dikin.

Îca sala Apê Mûsa ev gotin salên 80 î bû.

Îro dema Qetlîamên Helebçe, Qamişlo, Gazî û Hewlêrê Bîrên Botaşê, bîst hezar wundayên bêserûşûn di rojevê de ne, generalên mîna Velî Kuçuk, Hurşit Tolon, Necati Ozgen, Levent Ersoz û Hwd. em nas dikin, meyla me jî ber bi tesbîta Apê Mûsa de dadgere û fikra ku ev mexlûqat, ne mikun e ji Adem û Hewa, belê ji meymûnan, beraz û segan, heta ji hirç û keftaran bin xwurtir dibe.

Tebîni: Spas ji Enstîtuya Kurdî jibo Lêkolîn û Zanistiyê li Elmanyayê jibo mecaldayîna belavkirina vê nivîsê...

Zarathustra News – zarathustra_news@comhem.se